www.wjas.org

# Alîkariya lezgîn ji bo Bakur û Rojhilatê Sûriye

## Agahiyên dawî derbarê rewşa mirovî li Bakur û Rojhilatê Sûriye

*(20’ê Çilê 2026)*

Ji dema ku komên çekdar a hikumeta demkî ya Sûrî û çeteyên girêdayî vê dest bi êrişa herêma Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriye kirin, rewşa mirovî di herêmê de bi awayekî giran bêtir xirab bûye. Bi taybetî Kurd û kesên ku bi cîhadîstan re hevkarî nekin, dibin hedef. Bi taybetî jinên ku di saziyên sivîl û rêxistinên jinan de dixebitin, her wiha jî hemû kesên ku bi xweseriyê re dixebitin, tên êrîşkirin. Kuştin û êşkenceya kesên hedefgirtî hatine rapor kirin. Dîmen hene ku binpêkirinên mafên mirovan ên navneteweyî belge dikin. Wekî mînak, ofîsên saziyên sivîl û binesaziya civakê tên talankirin û wêran kirin; di nav wan de jî navenda tenduristiyê ya Heyva Sor a Kurdî li bakurê Şedadê ye.

Her wiha ofîsên Weqfa Jina Azad a Sûriya (WJAS) li Heleb, Tebqa û Reqayê jî hatine talankirin. Kar hatine rawestandin û gelek karmendên jin neçar bûn ku birevin û koçber bin.

Hejmara rast a koçberan ne diyar e, lê wê hîn zêdetir bin. Gelek malbat di dema revê de ji hev hatine veqetandin û hîn agahiyên teqez li ser rewşa endamên malbat û hevalên ku li paş mane nînin – ev rewşeke pir bi êş û dijwar e. Gelek kes hîn jî winda ne.

Koçberên ku piranî xwe digihînin Kobanê, Dêrik û Qamişlo, niha di dibistanan û avahiyên vala de tên bicihkirin. Stargehên koçberan tijî bûne. Ruxme ku tê çavbirêkirin ku hîna koçber bên.

Pêdiviyên jiyanî yên bingehîn kêm in û sermayê zivistanê rewşê hîn dijwartir dike. Bi taybetî xwarin, amûrên germkirinê, cil, betanî, şîr û hafadên zarokan bi lez hewce ne.

Tevî rewşa dijwar, WJAS li cihên pêwîst hîn jî çalak e û alîkariya lezgîn ji bo koçberan rêxistin dike. WJAS malzemeyan kom dike, rêz dike û li gel belav dike; her wiha bi pêşkêşkirina piştgiriya derûnî, bi guhdarkirin û bi axaftinên bi hestyarî re alîkarî dike.

**Alîkarî bidin xebatên Weqfa Jina Azad a Sûriya (WJAS)!**

**Demildest alîkarî bide!**

**HESABA BEXŞANDINÊ:**
**Kurdistanhilfe e.V.**
**Name: NOTHILFE**
**Hamburger Sparkasse**
**IBAN DE40 2005 0550 1049 2227 04**
**BIC HASPDEHHXXX**
(Hun dikarin li Elmanya baca bexişê vegerînin; ji kerema xwe navnîşana xwe binivîsin.)

